Hejmarên telefonan yên girîng

Di rewşa neçariyê de:

Polîs ..... **112 yan jî 117**

Telefona têkiliyê Polîs ji bo jinan
(Telesekreter; Polîsa jin paşê telefon dike) **031 332 77 77**

Ambûlans / Hawarî **144**

Li gel şideta navmalbatî û zayendî li gel polîsan her wisa xizmetên din yên şêwiriyê amade ne:

Opferhilfe Bern (Alîkariya mexdûran Bern) **031 370 30 70**

Opferhilfe Biel (Alîkariya mexdûran Biel) **032 322 56 33**

Lantana (şîdeta zayendî) Bern **031 313 14 00**

Vista (şideta zayendî + navmalbatî) Thun **033 225 05 60**

Programê fêrbûnê ji kiryaran: Navenda
pêşîlêgirtina şîdeta navmalbatî ya li Bernê **031 633 50 33**

Şêwrên giştî û şêwiriya hiqûqî tu dikarî li vê derê bibînî:

ISA – Saziya agahî û şîretê ji bo
arîşeyên biyaniyan **031 310 12 72**

Saziya şêwiriya hiqûqî ji bo kesên
di rewşa lezgîn ya li Bernê **031 385 18 20**

Swîsre Alîkariya penaberan **031 370 75 75**

gggfon – bi hev re li dijî şîdet
û nîjadperestiyê **031 333 33 40**

Alîkariya penaberan Bern **031 382 52 72**

CSP Bern-Hiqûq **032 493 32 21**

Fîlmên agahdarkirinê di derbarê hevjiyanê de tu dikarî bi vî zimanî û zimanên din li ser malperê bibînî:
www.police.be.ch

App'a me ji xwe re daxe:
www.police.be.ch/app

Tu me li ser Twitterê bişopîne:
www.police.be.ch/twitter

Kurmandisch/2000/Prävention 03/17

POLICE
police.be.ch

Li kantona Bern bi hevre ewle

Bi xêr hatî! Gelê li Swîsre bi hev û din û qanûnên ku serî li vir rêz. Ev bingehê ji bo pêkvejiyana bi aşitî ye.



Wisa em bi hev re û ewle dijîn li kantona Bern.

Li Swîsreyê gelên xwedî kokên herî cuda dijîn. Ji bo qanûnên bihevrejiyaneke aştiyane divê yase û rêbazên di navbera mirovan de bên qebûlkirin. Hemû mirovên li Swîsreyê xwedî maf û erk in, ku ji aliyê qanûnan ve ji wan re hatine dayîn.

Mafên herî girîng di destûrê Federal de
Bi nivîskî hatine diyarkirin. Wekî mînak:

> Hemû mirov li ber qanûnan wekhev in. Cudakarî û nijadpearestî qedexe ye.

> Jin û mêr xwedî mafên wekhev in.

> Hemû mirov di hilbijartina dînê de û pêkanîna îbadetê de azad in.



Polîs di jiyana rojane de

Polîs di jiyanê rojane de li Swîsreyê li gel gelan baş bi hevgir e û ji bo ewlekariya welatê me girîng e.
Polîs xwedî erk e, ji bo parastina tevahiya gelê Swîsreyê, bicîkirina qanûn û darizandina kiryaran.
Ji bo pêkanîna vê yekê jî, ew dikarin wekî din kontrolên şexsî bidin destpêkirin.
Gava tu werî kontrolkirin, divê tu belgeyên nasmeyê nîşan bidî yan jî bi awayeke din, ji bo zelalkirina nasnameya xwe destûr bîdî.

> Gotina agahiyên çewt suceke cezayî ye.

> Mafê polîsan heye eger pêwîst be te ji bo bêhtir lêpirsînê bi xwe re bibin qereqola polîsan.

> Polîs dikarin ji bo lêkolînkirin yan jî ji bo rêlibergirtina sûceke pêkan kinc, çente û tiştên din yên bi te re lêkolîn bikin.

Her wisa polîs jî divê li gorî rêbazan tevbigerin û nêzîkatiyeke hevbeş nîşan bidin.

> Polîs divê ji bo kontrolkirina şexsî sedemên (şênberê vexuyan) rave bikin.

> Polîsên jin û polîsên mêr, yên unîformayên wan ne li wan divê nasnameya xwe ya polîstiyê nîşan bidin.

Heger kontrola şexsî ya ji aliyê polîsekî yan jş polîsekê ve tê kirin li gorî te niheq be: Pirsa navê wî yan jî wê bike û dîrok, saet û her wisa cihê bûyerê li ba xwe binivîse.

Serlêdana bûyerê li nivîsgeha giliyê ya komandoyên polîs yên kantona Bern bike: beschwerdestelle@police.be.ch yan ji li qereqola polîsan ya nêzik.

Wekî ku li welatên din hin tevgerên diyarkirî li Swîsreyê jî qedexe ne û li gor qanûnan tên şopandin, wekî mînak:

> Destdirêjîya zayendî bi riya gotin, mîmîk yan jî kirinnan sûc e; li dijî jin, keç, kur û mêran. Gava ku tu rastî kiryaran bêyî xwe biparêze û li alîkariyê bigere.

> Civaka me de tu forma şîdetê tehmûl nake – her wisa şîdeta navmalî ya di navbera endamên malbatê de jî. Hemû kes dikarin polîs agahdar bikin – her wisa tu jî, gava tu şîdetê bibînî yan jî bibihîsî – mînak ji malên cînaran!

> Di doza dizîtî û zirardayîna malî de ev derbas dibe: Çi tişt malê te be, divê paşê jî malê te bimîne.

Heger tu mexdûr yan jî şahidê kiryareke sûcdar bî, telefonê polîsan bike (tel. 112 yan jî 117, bê pere). Em tevahiya salê şev û roj ji bo li ser kar in.